Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar 996 | 14-Îlon- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165

# Li Pakîstanê ji ber lehiyê hezar û 355 kes jiyana xwe ji dest dan

**Rêbeberiya Netewî ya Karesatan a Pakîstanê bi daxuyaniyekê ragihand ku ji nîvê Hezîranê û vir ve li Pakistanê ji ber karesata lehiyê ya rû daye hezar û 355 kes jiyana xwe jidest dane.**

Navenda Nûçeyan - Rayedarên Pakistanê ragihandin ku ji ber lehiya ku ji ber baranên mûsonê yên zêde mirine hejmara miriyan derket hezar û 355an û bi hezaran kes jî birîndar bûn û koçber bûn. Rêveberiya Netewî ya Karesatan dane li parêzgeha Hayber Pakhtunkhwa gihîştiye 292 kesan, 263 kesên din li parêzgeha Belûçistanê û 191 qurbanî jî li parêzgeha Pencab jiyana xwe jidest dane û bi giştî hejmara birîndaran li seranserê welat gihîştiye 12 hezar û 722 kesan.

**Ji sala 2010’an hezar û 600 kes ji ber lehiyê jiyana xwe jidest dabûn**

Hatiye ragihandin ku di sala 2010’an



di daxuyaniya xwe ya 7’ê Îlonê de piştrast kir ku 6 kes di 24 demjimêrên borî de li parêzgeha Sind jiyana xwe jidest dane.

**12 hezar û 722 kes ji lehiyê bandor bûne**

Di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku di nav miriyên nû de 3 kes li eyaleta Belûcistanê û 2 kes jî li de, lehî li tevahiya Pakistanê girtiye, di encama baranên zêde de, nêzîkî hezar û 600 kes jiyana xwe jidest dane. Lê çavkaniyên din jî dibêjin ku hejmara kesên jiyana xwe jidest dane nêzîkî sê hezar kes bûne û zêdetir ji 20 milyon kes bandor kirine.

Ev karesata herî xirab a di dîroka welat de hatiye jiyîn e û ya herî giran di heyama 80 salên borî de



parêzgeha Hayber Pakhtunkhwa ne û bi giştî li seranserê welêt hezar û 355 kes jiyana xwe jidest dane. Daxuyaniyê hat ser ziman ku jimara kesên ji ber lehiyê jiyana xwe jidest tê dîtin ku di encama wê de 650 hezar xanî wêran bûne û lehiyê jî zeviyên çandiniyê li 557 hezar hiktar erd têk biriye.

***JINHA***

# Qirêjiya Hewayê Yek Ji Sedemên Kanserê Ye

**Zanyaran tespît kirin ku qirêjiya hewayê dibe sedema rûdana kansera pişikê.**

Daneyan raxistin pêş çavan ku partîkulên zirav ên li nava dûyê wesayitan mûtasyonên nava şaneyên pişikê razayî çawa ‘hişyar’ dikin û wan vediguherînin kanserê.




Lêkolîn di heman demê de eşkere dike, bê mirovên ku çixareyê nakişînin çima ewqasî bi kansera pişikê dikevin. Her wiha têkildarî bandora giran a qirêjiyê li ser tenduristiya mirovan mîna ‘bang û hişyariyê’ ye.

Ji Enstîtuya Francis Crick Prof. Charles Swanton roja Şemiyê li Konferansa Komeleya Tibbî Onkolojî ya Ewropayê ya li Parîsê, daneyên bi dest ketin eşkere kir. Swanton got, “Rîska ketina bi kansera pişikê ya ji ber qirêjiya hewayê, ji ya kişandina çixareyê kêmtir e, lê belê li ser tiştа ku em hemû hilma wê dikin, kontrola me nîne.”

Kişandina çixareyê hîn jî sedema herî mezin a kansera pişikê ye, lê belê qirêjiya hewa jî li Îngilistanê ji her 10 nexweşên kanserê sedema yek ji wan e. Li vî welatî, her sal 6.000 kesên ku qet çixare nekişandine ji ber kansera pişikê jiyana xwe ji dest didin. -***ANF***

Sudoku:Pirs 6

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 4 | 1 | 7 | | 8 | | | |
| | | | | 5 | 1 | 2 | | |
| 3 | | | | 9 | | | 8 | |
| | | | 5 | 1 | | | 9 | |
| 6 | 9 | | | | | | 3 | 1 |
| | 1 | | | 6 | 7 | | | |
| | 7 | | | 2 | | | | 5 |
| | | 6 | 3 | 7 | | | | |
| | | | 1 | | 4 | 6 | 2 | |

Sudoku: Bersiv 5

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | 1 | 8 | 9 | 4 | 3 | 6 | 7 | 5 |
| 7 | 9 | 6 | 8 | 5 | 1 | 4 | 3 | 2 |
| 4 | 5 | 3 | 6 | 7 | 2 | 1 | 8 | 9 |
| 5 | 8 | 7 | 1 | 2 | 6 | 3 | 9 | 4 |
| 9 | 2 | 1 | 5 | 3 | 4 | 8 | 6 | 7 |
| 6 | 3 | 4 | 7 | 9 | 8 | 5 | 2 | 1 |
| 8 | 6 | 2 | 4 | 1 | 9 | 7 | 5 | 3 |
| 3 | 4 | 5 | 2 | 6 | 7 | 9 | 1 | 8 |
| 1 | 7 | 9 | 3 | 8 | 5 | 2 | 4 | 6 |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Ş | E | Ş | ■ | S | I | B | A | T |
| 2 | E | ■ | E | N | E | ■ | A | V | ■ |
| 3 | K | A | M | A | R | A | ■ | J | Ê |
| 4 | ■ | K | Î | ■ | G | ■ | D | E | K |
| 5 | L | I | ■ | T | O | R | I | N | ■ |
| 6 | A | N | F | ■ | V | ■ | L | Î | S |
| 7 | ■ | C | ■ | X | E | C | Ê | ■ | B |
| 8 | C | Î | R | A | N | ■ | R | A | ■ |
| 9 | A | ■ | E | V | D | Î | ■ | B | Ê |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | | ■ | | ■ | |
| 2 | ■ | | ■ | | | | | | |
| 3 | | | | ■ | | | | | |
| 4 | | | ■ | | | ■ | | ■ | |
| 5 | | | | | ■ | | | | ■ |
| 6 | | ■ | | ■ | | | | | |
| 7 | ■ | | | | ■ | | ■ | | |
| 8 | | | ■ | | | | | | ■ |
| 9 | | | | | ■ | | ■ | | |

**ÇEP-RAST**

1. Zengil
2. Kapeka ard
3. Dijbera germ... Temaşevan
4. Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tunekirin... Hejmarek
5. Bajarekî me... Di dîrokê de dewleteke kurdan
6. Lêdana bi piyan
7. Sedemkarê tevgerê, paldêr... Sendîkaya Karkeran a Swêdê
8. Cînavka şexsê sêyemîn ji bo rewşa netewandî... Şivanê ku alîkariya serşivên dike
9. Navber, mesafe... Cînavka pirsiyariyê ya ku tê wateya; li ku ye?

**JOR-JÊR**

1. Kesê ku di meyxaneyê de meyê digerîne... Cînavka pirhejmariyê ya xwerû
2. Hazir... Cure, celeb
3. Kanaleke televîzyona kurdî
4. Baneşana kêfxweşiyê... Rêxistina polîsan a naziyan... Beşeke malê, jûr
5. Roja piştî îro
6. Notayek... Wateya ku rasterast nehatiye nimandin
7. Cihê ku jiyana giyaneweran lê didome
8. Notayek... Bajarekî me
9. Têjikê miyê... Tûj

# `Bi rihê şoreşgerên di 12`ê Îlonê de li ber xwe dane, emê dagîrkeriyê têk bibin`

Rûken Ehmed diyar kir ku, ji bo gelê şoreger bi ser nekeve, dewleta tirk derbeyê 12’ê Îlonê wek çareseriyê dît û got, eger em bi rihê şoreşgerên ku li hember 12’ê Îlonê li berxwe dayîn tekoşîn bikin, emê bi ser bikevin. ***R-5***




Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 996 | 14-Îlon- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# TIRK JI NEXŞEYA KURDISTANÊ ACIZ BÛN, PDK’Ê JÎ RAKIR





**20’ê Tebaxê li ber derê Zanîngeha Zaxo nexşeya Kurdistanê hat danîn û 12’ê Îlonê jî bi fermana dijmin û dagîrkerê Kurdistanê, hat rakirin û nexşeya başûrê Kurdistanê li şûna wê hat danîn. Ev jî dide xuya kirin ku PDK’ê başurê Kurdistanê bi temamî radestî Tirkan kiri ye.**

## Kar û Welat



Ebdilbarî Mele Letîf diyar kir ku ew ji zarokatiya xwe ve ji çeksazkirina amûr û alavên elektronîk hez dike û got, eger mirov li ser xaka xwe be, çi kar bike bila bike dil şad e. ***R-6***

## ’Azadiya Rêber APO azadiya civak û jinê ye’




Endama saziya Malbatê Şehîdan Rojda Ehmed diyar kir ku wateya rast ya jiyana azad di kesayeta Rêber Apo de tê dîtin û got, Rêber Apo bi fikr û felsefeya xwe azadiya rast pêşkêşî jinan kir û deriyê jiyanê ji wan re vekir. ***R-2***

## ’Bi pêngava Mirovî û Ewlehiyê planên çeteyên DAIŞ’ê û dagirkeriya tirkî têk çûn’

Siyamend Elî diyar kir ku pêngava Mirovî û Ewlehiyê gelek planên çeteyên DAIŞ’ê Têk birin û got, heta çareseriyeke bingehîn ji pirsgirêka çeteyên DAIŞ’ê û malbatên wan re neyê dîtin, wê xetera wan dewam bike. ***R-4***



## HRE’yê : 16 dagirker hatin cezakirin




Hêzên Rizgariya Efrînê (HRE) diyar kirin ku di çalakiyên wan yên li dijî artêşa Tirk a dagîrker û çeteyên li gundewarên bakurê Helebê de 4 leşkerên artêşa Tirk ya dagirker û 12 çeteyên wê hatin kuştin. ***R-3***



Zozan CIZÎRÎ
**Suwarên Hespê Xelkê, Her Peya ne!**
*R-2*



DILYAR CIZÎRÎ
**PDK stuna mayîna Tirkiyê ya di Başûr de ye**
*R-4*

Memed Serdar
**Dewleta Tirk, Faşîzm Jî Xerab Kiri ye**
*R-5*



Sîpan Şînda
**Documenta**
*R-7*

# Perwerdekirina berdevkên dibistanan asta xwendinê xurt dike

Desteya Perwerdê û Fêrkirinê ya herêma Cizîrê bi armanca pêşxistin û fêrkirina berdevkên dibistanan yên jin, 11`ê Îlonê li Akademiya Şehîd Egîd Cîlo ya Biranşên Kurdî dest bi perwerdeyeke berdevkan ya xweser kir.

**Rojbîn Zagroz/Qamişlo**

Perwerdeya berdevkên dibistanê 11'ê Îlonê destpê kir û wê 12 rojan dewam bike. Dereya vê perwedeyê bi 60 mamosteyên jin destpê kir. Herwiha perwerde ji saet 8`ê sibehan heya 5`ê êvarê dewam dike. Derbarê mijarê de berdevka jin ya desteya Perwedê û mamosteyên ku li perwerdê hazir dibin ji me re axivîn û dan zanîn ku ji bo pêşxistina asta berdefkan ev perwerde giring e.

**`Emê bi rêya perwerdeyê pirsgirêkan çareser bikin`**

Berdevka jin ya Desteya Perwerdê û Fêrkirinê li kantona Qamişlo Henan Iniz da zanîn ku ev çend sal in ev perwerde di plana wan de bû û axaftina xwe wiha domand: “Pêwîstî bi perwerdeya berdevkên dibistanan pir hebû, lê ji ber ku derfetên me kêm bûn û demê me jî zêde tinebû, her sal perwerde dihat sekinandin. Lê îsal me giranî da milê perwerdeyê, ji ber ku sala çûyî gelek kêmasî li dibistanan derdiketin. Ji bo wê jî me perwerdeya xwe da destpêkirin da ku îsal em van pirsgirêkan derbas bikin.”

**Wane û semînerên perwerdeyê**

Henan behsa wane û semînerên ku wê di perwereyê de bên dayîn kir û wiha pê da çû: “Wê li ser giringiya perwerdê, xwenaskirin, zayinperestî, jinolojî, çand û exlaq, rexne û rexnedayîn, Netewa Demokratîk û wê li ser şerê taybet jî wane bên dayîn û emê giranî bidin milê giringiya perwerdeyê, da ku wateya perwerdeyê baş bê naskirin.”

Henan di berdewamiya axaftina xwe de got, niha perwerde li bajarê Qamişlo û Hesekê tenê tê dayîn, di dema pêş de emê hewl bidin li tevayiya bajarên herêmê bidin destpêkirin. Da ku tevayiya berdevkên dibistanan werin perwerdekirin.

**`Jin bêhtir dikare dibistanê birêve bibe`**

Henan da zanin ku ji ber ku piraniya





mamoste û berdevkên dibistanan jin in, wan ev perwerde xweser da despêkirin û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Piraniya berdevkên ku hatine hilbijartin jin in, lewra jin bêhtir dikare dibistanê bi rêve bibe. Ji bo wê jî, em van berdevkan perwerde dikin, da ku ew jî mamoteyên li dibistana xwe perwerde bikin û zarokanji her alive xurt fêr bikin.” Henan Iniz di dawiyê de got, dema berdevkên me perwerdeya xwe bi dawî kir û li dibistanên xwe vê perwerdeyê bêxin piratîka karê xwe, wê tevayiya pirsgirêkên heyî derbas bikin û wê bikaribin dibistana xwe bi awayekî serkeftî birêve bibin.

**`Pêwîstiya me bi vê perwerdeyê hebû`**

Mamosteya bi navê Gulşa Mûrad ku ew jî derbasî vê perwerdeyê bûye, da zanîn ku pêwîstiya wan bi vê perwerdeyê hebû û axaftina xwe wiha domand: “Ev sala yekê ye ku ezê rêveberiya dibistanê bikim. Ji bo wê jî pêwîst bû ku em di perwedeyêk wisa de derbas bibin. Lewra pêwîstiya me bi giringiya perwerdê, çand û exlaq, rexne û rexnedayîn û rê û rêbazê birêvebirina dibistanê heye. Da ku her berdevkek dibistana xwe bi awayekî rast û xurt bi rêve bibe.”



**`Perwerde mirov zana dike`**

Gulşa diyar kir ku ev perwerde wê sûdekê pir mezin li wan bike û ev yek li axaftina xwe zêde kir: “Giringiya pererdeyê pir heye, lewra dê encamên pir baş bide û sûd li tevayiya mamosteyan ku îsal dê dibistanan bi rêve bibin, bike. Ji bo wê jî divê mamoste tev di vê perwerdeyê de derbas bibin û fêrî rê û rêbazên rast û dirust bibin. Ji ber ku mirov çiqas di perwerdeyan de derbas bibe ewqas zana dibe. Herwiha dema ez perwerdekirî bim, kî birsekê ji min bike, wê demê ezê bikaribim bersivek rast bidim.”

**`Wê ev perwerde asta me di her alî de pêş bixe`**

Gulşa bîr xist ku mamosteyên perwerdeyê didin wan jî, pir başin û sûdê ji wan digrin û got, wê ev perwerde asta me di her alî de pêş bixe, herwiha emê dibistanên xwe jî bi awayekî serkeftî birêve bibin. Gulşa Mûrad di dawiyê de got, em bi hêvîne ku pewerdeyên bi vî rengî zêde bibin û tevayiya mamoste û rêveberên dibistanan tê re derbas bibin. Lewra perwerde riya rast nîşanî mirov dike. Rêbert APO jî gotiye, perwerde, perwerde, perwerde. Ji bo wê jî dema rêbertiyê got, perwerde di vir de em bihêvîne her kes derbasî perwerdeyan bibe.



**Suwarên Hespê Xelkê, Her Peya ne!**

**Zozan CIZÎRÎ**

Di vê serdemê de her gelê ku xwe birêxistin neke, hêza xwe ya parastinê saz neke û li bendê be hêzên derve wana biparêze, ew mehkûmê têkçûnê ye. Daneyên vê nêrînê piştrast dikin wekî nimûneya Afganîstanê, roj bi roj zêdetir dibin. Lewre girîng e her gelekî demokrasîxwaz vê nimûneyê baş bixwîne.

Wekî tê zanîn Amerîka van rojan 21. salvegera 11'ê Îlonê ya êrîşa li ser Burcên Cêwî bibîr anî. Em li wan rojan vegerin:

Beriya 21 salan grûbeke çekdar a Îslamiyên Radîkal, êrîşeke mezin li ser Burcên Cêwî yên Navenda Bazirganiya Cîhanê ya Amerîkayê pêk anîn. Her wisa berpirsê wan êrîşan jî serkêşê El-Qaîde Ûsame Bîn Ladîn -ku wî bi xwe berpirsiyariya êrîşan negirt ser xwe!- nîşan dabûn. Bi vê bûyerê re DYA (Amerîka) wekî mûdaxele leşkerên xwe derbasî nav xaka Afganîstanê kir. Serokê DYA yê wê demê Corc Bush, sedema êrîşên xwe yên li ser Afganîstanê wiha rave dikir: “Hêzên wan, leşkerên Talîban û kampên perwerdê yên terorîstan dikin hedef. Van êrîşan heman demê ‘ji bo xort, jin û zarokên Afganîstanê yên birçî û zilmê dibînin’, ji bo pêdiviyên wana yên xwarin û tenduristiyê dabîn bikin, pêk tên.” Û sala par meha Tebaxê gava DYA leşkerên xwe ji Afganîstanê kişand, rewşeke ku -gava xelkê Afgan ji bo rizgariyê bi hawar hawar xwe diavêt ber lingê balafirên Amerîka- rûmeta gelekî tune dike, jiyan bû.

Encama şerê 20 salan ê DYA û Talîban li Afganîstanê meşandin; ji her du aliyên Amerîka û Efganîstanê 172 hezar zêdetir kesan jiyana xwe ji dest da. Ji vê wêdetir, çi pirsgirêkeke gelê Afgan çareser bû? Vaye îro jî Afganîstan meydana şer e. Jinên Afgan ji berê zêdetir rastî zilm, zext û êşkenceyê tên. Ji hemû mafên xwe yên perwerde û serbestiyê bêpar in. Birçîbûn û xizanî kûrtir bûye. Hebûn û nebûna zarokan ne li xema tu hêzeke desthilatdar e. Hema rewşa ku dibêjin, “Fîl dimeşin, morî di bin lingên wan de diperçiqin” radixe pêş çavan. Li meydanê dewleta Tirk a dagirker-qirker, Suûdî, Qatar, îstixbarata Pakîstanê ji bo berjewendiyên xwe herêmê her aloz dikin. Rexmê ev rewş pir eşkere û ron e jî, Amerîka gava leşkerên xwe ji Afganîstanê kişand, şûna xwe ji leşkerên dewleta Tirk re hişt. Ango xelkê Afgan ê belengaz ji însafa dewleta Tirk a kirêgirtî re hişt.

Ev serpêhatiya Afganan ji bo her gelekî demokrasîxwaz ji gelek aliyan ve ezmûneke hînker e. Gelê Afgan ê 20 salan pala xwe da hêzên derve, ne xebateke xwe perwerde bike meşand, ne xebateke xwe birêxistin bike, ne jî xwe biparêze pêş nexist. Lewre gava Amerîka leşkerên xwe paşve kişand, bi taybetî jinên Afgan, bi giştî gelê Afgan wekî çeng û perên wana şikest, di nava pencên berjewendiyên desthilatdaran de man. Ji bo wê îro bi zagonên şerîateke paşverû ya cinsiyetperest, ji zilma berê xirabtir bi serê wana de tê. Car caran komeke jinan çalakiyek biçûk bikin jî, kes ne dengê wana dibihîse, ne jî bi hawara wana ve diçe. Pêşiyên me gotine, “suwarên hespê xelkê, her peya ne”!

Elbet ji bo gelek ji bin zilm û bindestiyê rizgar bibe û bikeve rêya pêşketinê, xebata perwerdeya civakî û xwe birêxistinkirinê du xebatên sereke ne. Di vê wateyê de ezmûna Rojavayê Kurdistanê ku bi hûr û girê xwe, tevî dost û cîranên xwe yên azadîxwaz bi girîngiyek mezin berê xwe didin perwerdeyan, tevlî sîstema birêxistinbûna civakî dibin, hêza xwe ya parastinê xurt dikin, dibe rûyê din ê berevajiyê Afganîstanê ku hêviya çareserî û pêşketinê mezin dike. Ji bo vê hêja ye, mirov bi hûrbînî rewşa pêşveçûna Rojavayê Kurdistanê rast bixwîne. Lewre di nivîsên pêş de ez ê jî bêhtir hewl bidim vê xebata birûmet û dîrokî ya Gelê Azadîxwaz û Şerker bigirim dest.



# Filma Cîran Û Zaroktiya Li Ser Xetê

Karekterê herî xurt mamosteyê Beesî bû; hişk ji temamê gund qut û dixwest zarokan bike Ereb, erda wan bi xurmeyan bike Ereb û xelkê wê bike dijminê Cihûyan û Îsraîlê. Bapîrê Şêro gava heyfa xwe bi wî mamosteyî tîne bi gotinên, “Mamoste, mirov Îsraîlê ji jiyana te weke dijmin derêxe, wê jiyana te bişibe çi?” wê karektera xurt terîf dike.

**LUQMAN GULDIVÊ**

Ez ne şaş bim, sala 1987´an bû û ez diçûm sinifa 3´yan a dibistana destpêkê li Nisêbînê, li mektebeke li ser xetê. Ji sinifan û gava mirov bi dîwarê dibistanê ve hildikişiya, li aliyê başûr û rojhilat Qamişloyê xuya dikir. Di navbera mektebê û Qamişloyê de zevî hebûn. Li ser xeta sînor jî ji bilî mayîn û têlan, ew bircên metal ên nobetdariya leşkerên dewleta dagirker hebûn. Hingê dewleta Tirk a ku dixwest me bike Tirk, lê ji bo vê jî têra xwe mekteb çênekiribûn, nofekî me (yanî beşekî me) danê sibehê, nofekî din piştî nîvrojê asîmîle dikir. Wê dewleta dagirker dibistan êvaran jî ji bo ku kal û pîrên me asîmîle bike, bi kar tanîn. Ez van hewlên wê ji bîr nakim, lewma timî tîne bîra min, ka divê mirov li dijî wê çiqasî hewl bide ji bo ku xwe biparêze.

Axir ez ji wî beşê piştî nîvrojê bûm. Rojeke wê salê - bi rastî qenc nayê bîra min kengî bû - leşkerên li ser birca nobetdariyê ya hesinî ya nêzî mektebê gule teqandin. Ez jî li hewşa mektebê bûm. Weke gelekan ez jî di cih de bi dîwarê hewşê ve hilkişiyam. Zilamek ji qederê 200 - 300 metroyî ve di nav erdan de dibezî û qarewara wî bû. Leşkeran jî pêşî gule ji bo hişyarkirinê berdabûne. Gava me berê xwe dayê du guleyên din teqiyan. Zilamê li hember, pêşî weke ku bilikume lê hat, paşê şewişî û di dawiyê de kete erdê.

**Çîrokên Binxet û Serxetê**

Dîtira rojê em hîn bûn ku hatiye kuştin. Ew zilam dînek bû, dînekî Qamişloyê. Ne carek û ne didu bû ku dihat nêzî xetê. Di zarokatiya min de sal nebû ku jinên nêzîkî têlan giya didirûtin neyên kuştin, berxvanên zarok pê li mayînan nekin, zarok bi mayînan nelîzin û neyên kuştin. Ez hîna ne diçûm dibistanê, yan 5 yan jî 6 salî bûm, hindik mabû leşkerên li ser sînor dayika min bikujin. Em di xaniyekî de di kirê de bûn, li qatê yekê. Xwediyê xanî balkona berê wê li rojhilat tam li hember sînor û sîloyên Qamişloyê, serûser cam kiribû. Dengê teqeyekê hat, dayika min li ber çavên min kete erdê û kunek di camê de vebûbû. Tam li dehma serê dayika min kun vebûbû.

**Fîşek Li Dayika Min Neketibû, Lê Ji Tirsa Wê, Dayika Min Ji Hiş Ketibû.**

Belkî ji qehrê wê bû, belkî jî rengekî tolhildanê: 12-13 salî min jî weke gelek zarokan dest bi birrîna têlên sînor kir. Me ew bi benîşt û bi şekirkan difirotin û leşkerên dagirker jî di berf û baranê de di kela germa havînê de ew têl nû dikirin. Ew sînor belayek bû, niha bûye belayeke dîwarkirî û xirabtir. Min hîna nû li filma Cîran temaşe kir û her tişta vê filmê, zaroktiya min anî bîra min. Ji ber wê, weke ku çîrok neya Mano Xelîl be, lê yeke li taxa me be. Çîrokên binxetê û serxetê çiqasî dişibin hev!

**Ji Bilî Çend Qisûran Senaryo Xurt E**

Senaryoyeke birêkûpêk hema hema tekûz e, herçî behsa cîrantiya malbata wî zarokê xweşkok Şêro û malbata Cihû dike. Evîna Azad (Apê Şêro) û Hannah a cîran jî xweşik hatiye hûnandin. Lê karekterê herî xurt, ne Azad, ne dayika Şêro Rewşan, ne jî bav û bapîrê Şêro… Na. Karekterê herî xurt mamosteyê Beesî bû: hişk ji temamê gund qut û dixwest zarokan bike Ereb, erda wan bi xurmeyan bike Ereb û xelkê wê bike dijminê Cihûyan û Îsraîlê. Bapîrê Şêro gava heyfa xwe bi wî mamosteyî tîne bi gotinên, “Mamoste, mirov Îsraîlê ji jiyana te weke dijmin derêxe, wê jiyana te bişibe çi?” wê karektera xurt terîf dike. Xurmeya wî, wê xwe li ber serma Rojava negirta. Wî jî xwe li ber dijwariyên van keviyên rejîma Beesê negirt. Yê mayî, Erebekî din bû. Beesê bi darê zorê biribû Cizîrê: Bi wî yên weke wî Kembera Ereb çêkiribû. Ew jî cîranekî din ê mala Hemo bû. Aliyekî din ê mexdûrên Beesê. Lê bi wî karakterî em aliyekî diyarker ê dîroka Rojava hîn dibin. Jinapa Şêro, Sewda jî rola xwe baş dike, lê tiştek heye ez ê di dilê xwe de nehêlim. Herçî Kurmanciya Sewdayê ye, têra xwe bi mesele ye. Ew çend gotinên ku dike, dikarî bi alîkariya xelkê xweşiktir hîn bibe.




Di çîrokê de zelûliya rêya ku Azad berê xwe didiyê zelûliyeke ne lazim bû: “Ez ê biçim Çiyayê Şengalê, nav Êzîdiyên me. Ji wir jî biçim çiya”. Li vir gotina “Êzîdiyên me” jî ne gotineke bêguneh e. Lê ez bi wê danakevim.

**Pirsgirêka Esasî Destpêk Û Dawî Ne**

Bi giştî çîroka filmê, ji bo yên weke min, ne çîrok lê serpêhatî bû. Nexasim kirinên zarokan. Em jî bi mayînan lîstin, em jî li dibistanan bi darê zorê hînî zimanekî din kirin, wan mamosteyan li me jî xist ji ber ku me bi zimanê dewletê nedizanî.

Lê destpêka filmê, yanî tişta dike ku çîrok bê gotin û dawiya filmê ya ku dawiyê li çîrokê tîne, hiseke welê bi min re çêkirin, weke ku li filmê nehatibin. Weke ku pînekirî bin. Yanî helbet derhêner bi qasî ku Kurdekî Rojava ye, ewqasî jî ji Swîsrê ye. Lê mirov dikare van aliyên filmê ku heyatî ne, nepînekirî jî çêke. Muhtemel e ku rola fonên ji bo çêkirina filmê jî kiribe ku derhêner vê destpêkê û vê dawiyê deyne. Lê girêdana bi Swîsreyê re hatiye danîn, bi ya min ne serketî ye. Nexasim jî ew hatina ecêb a nav penaberan, ewa ku Ewrûpiyên [ji me çêtir] tîne hemberî me [belengazên Kurd] hîç çênebûye. Heger Şêro û Hannah hev ewqasî jidil hembêz dikin, ma ne diviyabû ev dawî ne holê be, ew destpêk ne holê be!-

***Ozgurpolîtîka***



**Documenta**

**Sîpan Şînda**

Îsal Documenta ya pazdemîn li bajarê Kasselê yê Elmanya yê pêk hat. Ez bawerim Documenta mezintirîn organîzasyona hunerî ya cîhanê ye. Ev organîzasyon ev cara pazdê ye pêk tê û ji gelekî welatên dunyayê hunermend, saziyên hunerî û çandî tevil dibine. Vê organîzasyonê îsal di 18 yî hezîranê de dest pê kir û di 25'ê Îlonê de jî bi dawî dibe. Yanê ji 3 mehan zêdetir xebatên hunerî didomin û weke li jorê ji min gotî, hunermend, akademîsyen, nivîskar û gelek kesên ji hunerê hez dikine tevlî vê organîzasyonê dibin. Ev organîzasyona ew qas mezin û dirêj dom dike, ji beriya 75 salan dest pê kirî ye. Her pênc salan carekê tê çêkirin û ji Çînê bigire heta Amerîka, ji Erebîstanê bigire heta Meksîka, ji Japonya bigire heta welatên Kanada ji hemû deverên cîhanê hunermend bi hunermendiya xwe, bi berhemên xwe ve têne wêderê tevlî dibin, pêşendanên xwe çêdikine, welatê xwe, netewa xwe û hunera xwe didine naskirin. Ne tenê hunera xwe didine naskirin, hunerê li wir diafirînin. Bi hev re, bi giyanekî hevpar hunera xwe pêkêş dikine. Ji hevdu sûdê werdigirin, fêr dibin, weke moriyan bê sekin bi hev re hunerê pêşve dibin. Tu wan hunermendên ku her awirek ya wan, her xêzek ya wan, her nêrînek ya wan, her hilmek ya wan huner jê dibare, li kolanekê bibînî tû wê bêjî ev huner ne di mejî û hestên wan de hatiye afirandin û bi dest û tiliyên wan hatiye xêzkirin.

Ne tenê huner li wêderê tê afirandin û pêşkêşkirin, herwiha di warê entelektûelî de jî, gelek kar û xebat têne kirin. Saziyên hunerî, akademîsyen bi rojan li ser hunerê, sazîbûyînê, afirandina hunerê, qelsiyên hunerê, hevkariya hunerî, civakî, mafên zarokan, hunera zarokan, ya jinê, hevkariya bi hunermendên bê dewlet re û hwd gengeşî dikin. Bi vê girêdanê, ji bo pirrê wan kesên ku tên û tevlî vê organîzasyona mezin dibin, alîkariya ji bo hunermendên bindest, di girtîgehan de ku nikarin hunera xwe bi rihetî bidine naskirin û pêş bixin, gelekî girîng e. Ji bo min ji cara ewil bû ku ez tevilî vê pêşendana Documenta yê (documenta fifteen/pazdeh) bûm. Ez ne hunermend im û çi xebatên min yên hunerî ji nînin. Lê belê pêşendanekî gelekî hêjayî ye ku mirov her car tevil bibe. Min gelekî mereq kir ku gelo ka çend hunermendên Kurd, yan saziyên hunerî yên Kurd tevilî vê pêşendanê bûyîne. Min berê xwe da malpera Documenta fifteenê, lê mixabin min tenê yek saziya Kurdan dît ku tevilî vê organîzayonê bûyî ye. Komîna Fîlman ya Rojava. Li xana Fridericianumê her roj danê sibê ji seet 10'ê sibaha heya 7'ê êvarî documentera Komîna Fîlman ya Rojava tê weşandin. Documenterekî gelekî xweş çêkirine û gelek dihate temaşekirin jî. Lê mixabin ewqas saziyên Kurdan yên hunerî, ewqas hunermendên Kurd li Ewropa tû kes tevlî vê organîzasyonê nebûn e. Ev tiştên wiha ji bo Kurdan derfetin ku xwe bidine naskirin. Lê mixabin diyare ku Kurd, hema dixwazin xwe li hevdu bidine naskirin. Mînak: min çend saziyên Filistînî dîtin û ez bi çend hunermendên Filistînî re axivîm. Lê mixabin min ne Kurdek ne hunermendek kurd û ne jî navê saziyek ya Kurdan dît.

# Kar û Welat

Ebdilbarî Mele Letîf diyar kir ku ew ji zarokatiya xwe ve ji çeksazkirina amûr û alavên elektronîk hez dike û got, eger mirov li ser xaka xwe be, çi kar bike bila bike dil şad e.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Welatiyê bi navê Ebdilbarî Mele Letîf yê 56 salî ku ji bajarê Qamişlo ye, ev 35 sal in karê çeksazkirin amûrên Elektronîk dike. Ebdilbarî rojane li dikana xwe ya biçûk ya li taxa Hilêliyê bi saetan li pişt maseya xwe di rûdinê û amûrên Elektronîk yên xirabe yên wek radyo, telefizyon, kompîter û gelek amûrên girêdayî karê wî kontrol dike û wan çeksaz dike. Piraniya welatiyên bajarê Qamişlo û malbatên li taxê jî Ebdilbarî nas dikin. Ji bo wê jî dema ku amûrên wan yên malê xirab dibin yekser berê xwe didin wî, da ku ji wan re çeksaz bike.

**Bi çeksazkirina amûr û alavên elektronîk tê naskirin**

Ebdilbarî di zarokatiya xwe de dest bi vî karî kiriye û heskirina karê xwe bi girêdana walatê xwe ve girê dide û dibêje: " Ez ji pîşeya ceksazkirina alavên elektronîk û elektrîkê hez dikim. Dema ez biçûk bûm, hertim min amûrên malê yên xirabe çeksas dikir û tê de dixebitîm. Wê demê min nizanîbû ka çawa amûr tên çeksazkirin, lê her carê dema ku min amûrekê kontrol dikir, ez fêrî tiştekî nû dibûm. Rojbiroj her ku mezin bûm, bêhtir ez pê ve hatim girêdan. Ji ber vê yekê jî min xwendina xwe ya amadayî di beşa elektrîkê de qedand, û ez fêrî çaksazkirina piraniya amûrên elektrîkî bûm û ez di karê xwe de jîr bûm. Eger mirov bi walatê xwe ve girêdayî be wê demê mirov bi karê xwe ve jî tê girêdan û di karê xwe de serkeftî dibe."

Ebdilbarî got, piştî ku min dibistana amadeyî bi dawî kir, ez derbasî pêmangeha xeta tirênê ya li Helebê bûm. Di pêmangehê de ji bilî fêrbûna di warê elektronîk de, ez fêrî çeksazkirina alavên nîşana tirênê bûm. Piştî qedandina peymangehê, min demekê li rawestgeha tirênê kar kir. Li wê



derê min alavê nîşaneyên trênan çeksaz dikir. Piştî wê jî ez bûn berpirsê beşa trênê ya navbera rawestgehên herêmên Cizîre, Dêrezor û Reqayê.

Ebdilbarî da da zanîn ew dizane tevayiya amûrên girêdayî Elekron û elektirîkê çeksaz bike û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ez amûrên elektronîk û elektrîkê yên piçûk û mezin çeksaz dikim. Lê ji ber dikana ku ez tê de dixebitim, pir piçûke ez zêde nikarim li ser amûrên mezin bixebitim."

Ebdilbarî destnîşan kir ku dema wî ya ceksazkirina amûran ne diyare û wiha pê da çû: "Ez destpêkê cihê xirabe kontrol dikim. Piştre dest bi çeksazkirina wê dikim. Demê çeksazkirinê jî ne diyare. Lewra her amûrek li gorî xirabûna tê de dem diçe. Hin amûr hene çeksazjkirina wan bi çend deqeyan xilas



dibe, hin jê jî çend roj dem dibin."

**`Bi heskirinê zehmetî derbas dibin`**

Ebdilbarî behsa zehmetî û astengiyên ku di kar de rastî wan tê kir û wiha got: "Ez herî zêde zehmetiyan di peydekirina parçeyên amûran de dikşînim. Hin caran jî ez zehmetiyan ji ber tinebûna elektirîkê dikşînim, ji ber ku carnan elektirîk bi saetan qut dibe û ev yek karê min dide sekinandin. Ji bilî van zehmetiyan, di dema kontrolkirin û çeksazkirinê de çavên min diêşin û lawaz dibin. Lê çiqas zehmetî hebin jî, dema ku mirov heskiriyê karê xwe be wan zehmetiyan derbas dike."

Ebdilbarî derbarê berdewamiya karê xwe de, teqez kir ku karkirina di warê elektronîk de pîşeyeke ku her kes nikare fêrî wê bibe û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "kesê ku vî karî bike pêwîste heskiriyê wê be. Lewre eger mirov ne aşiqê karê xwe be, bi pêş nakeve. Ji bo wê jî divê mirov bi xwestek be, da ku di karê xwe de serkeftî be û domandina karê xwe bike."

**`Şuna ku biçin walatên xelkê û koletiya xelkê bikin bila sûdê li civaka xwe bikin`**

Ebdilbarî bal kişand ser girêdana xwe ya bi kar û welatê xwe ve û wiha got: "Tevî kêmbûna pereyê ku ez ji karê xwe dertînim, ez ti caran nafikirim ku koçberî welatên Ewropayê bibim, ji ber ku ez tenê dikarim li welatê xwe û li ser axa bav û kalên xwe bijîm. Rewşa min li vir çawa be jî, ji jiyana Ewropayê xweştir e. Ji bo wê jî heta ez saxbin ezê li welatê xwe bim û ez karê xwe û bêhna xaka xwe nadim bi xweşiya ti welatîn cîhanê."

Ebdilbarî Mele Letîf di dawiya axaftina xwe de got, hêvîdarim ku hertim ewlekarî û ewlehî li herêma me û tevahiya Sûriyê hebe û koçberî jî bi dawî bibe. Da ku xwediyên vê xakê li ser xaka xwe bin û parastina civaka xwe bikin. Bi taybet kesên xwedî pîşe û pispor, li şuna ku biçin Ewropa bila sûdê li civaka xwe bikin.

# 'Amadekariyên pêşwazîkirina xwendekaran li herêma Şehbayê di asteke bilind de ne'

**Zana Roj / Şehba**

**Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya herêma Efrînê diyar kir ku avakirina sîstema xwendinê di rewşa koçberiyê de, ne hêsan e û got, tevî hemû zehmetiyan em her sal gavên mezintir diavêjin.**

Piştî dagirkirina Efrînê ji aliyê dewleta Tirk ya dagirker û çeteyên wê ve, gelê Efrîn koçberî herêma Şehbayê bû, Tevî rewşa dijwar û dorpêça li ser herêmê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya herêma Efrînê bênavber kar û xebatê perwerdeyê birêvebir. Desteyê ji nûve sîsetma xwe ya perwerdeyê rûniştand, dibestan û pêmangehê bi zimanê Kurdî vekir.

Derbarê rewşa perwerdeya xwendekaran ya sala nû, berdevka Jin ya Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya herêma Efrîn, Orûba Xelîl ji me re axivî.




Orûba Xelîl bal kişand ser destpêka avakirina sîstema perwerdeyê li herêma Şehbayê û wiha got: "Ji destpêka bicihkirina gelê Efrînê li herêma Şehbayê, tevî hemû zehmetiyanjî, Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya herêma Efrînê di demeke pir kin û awarte de xwe bi rêxistin kir û sîstema perwerdeyê roj bi roj pêş xist. Lê Ji ber hejmara xwendekaran pir zêde bûn, di milê peydakirina dibistanan ji bo xwendekaran pir zehmet bû û nîn bûn, ji ber ku dibistanên heyî yan hatibûn rûxandin yan jî malbatên koçber di wan dibistanan de bicih bibûn."

Orûba Xellîl diyar kir ku desteya Perwerde û Fêrkirinê ya herêma Efrînê bi îradeyeke xûrt tevaiya astengyan derbas kir û wiha dirêjî da axaftina xwe" :Bi Îsrarbûn û xwesteka xwendekaran ya ji bo perwerdeya bi zimanê dayîkê, me hemû astengî derbas kirin. Di demeke Kurt de me mamoste amade kirin û dest bi perwerdekirina xwendekaran kirin. Li hemberî Îradeyê tevayiya astengyan têk diçin.

Berdevka Jin ya Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya herêma Efrîn, Orûba Xelîl da xuyakirin ku amadekariyê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ji sala xwendinê ya nû di asteke bilind de ne û axaftina xwe wiha qedand : "Amedekariyên me ji bo pêşwazîkirina sala xwendinê ya nû di astên bilin de



ne. Ji bo pêşxistina ast û şêwazê wênedayînê, dewreyên perwerdekirina mamosteyan ya biranşan hatin vekirin. Hejmara dibistanên di herêmê de hatine avakirin 72 dibistanin. Herwiha nêzî 15 hezar xwendeka bi zimanê dayîkê dixwînin. Hejmara mamosteyan di herêmê de 1110 mamoste di beşên cûda de perwerdeyê didin. Hêjayî bi bîranînê ye ku di sala nû de sîstema ezmûnan di gîştî herêmên bakur û rojhilatê suriyê de wergeriye sîstema nirxandinê da ku zêdetir xwendekar di milê îdeolojîk de xurtir bibin.



# Dewleta tirk bi rêya PDK'ê nexşeya Kurdistanê li ser Zanîngeha Zaxo da rakirin!

Piştî 22 rojan ji danîna nexşeya Kurdistanê li ser Zanîngeha Zaxo, dewleta Tirk nexşeya Kurdistanê da rakirin, tenê nexşeya Başûrê Kurdistanê hat hiştin.

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Li gor zanyariyên ajansa ROJNEWS bi dest xistin, 12 Îlonê nexşeya Kurdistanê li ser Fakulteya Zanistên Mirovahiyê ya Zanîngeha Zaxo hat rakirin û li şûna wê nexşeya Başûrê Kurdistanê hat danîn. Fakulteya Zanistên Mirovahiyê ya Zanîngeha Zaxo îsal di roja 20'ê Tebaxê nexşeya Kurdistana mezin li ser dîwarê xwe danabû. Lê piştî 22 rojan ev nexşe bi biryara serokatiya Zanîngeha Zaxoyê, hat rakirin.

Çavkaniyek ku bûyiye şahidê bûyerê, ji ajnsa ROJNEWS re ragihand ku nexşe di saet 2-3'yê berbanga sibeha 12'ê Îlonê de hat rakirin û tenê nexşeya Başûrê Kurdistanê bi heman dîzaynê li ser dîwar hat danîn.

Li gor agahiyên hatîn bi destxistin, Wezîrê Hikûmeta Herêmê yê ji bo Karûbarên Pêkhateyan Aydin Maruf ku Tirkmene û bi nêzîkatiya xwe ya li gel dewleta Tirk tê naskirin, di rojên borî de serdana Beşê Zimanê Tirkî ya li Zanîngeha Zaxoyê kiriye û ev nexşeye dîti ye.

Li gor gotina çavkanî; dewleta tirk bi rêya Aydin Maruf zext li ser berpirsên hikûmeta Herêmê kiriye da ku ev nexşe li ser dîwarê zanîngehê were rakirin. Piştre jî ji serokê zanîngeha Zaxo re hatiye gotin ku divê nexşeya Kurdistanê bê rakirin.

Heta niha serokatiya zanîngeha Zaxoyê ti daxuyaniyek li ser sedemê rakirina nexşeya Kurdistana neda ye.




# HRE'yê : 16 dagirker hatin cezakirin

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Hêzên Rizgariya Efrînê (HRE) diyar kirin ku di çalakiyên wan yên li dijî artêşa Tirk a dagirker û çeteyên li gundewarên bakurê Helebê de 4 leşkerên artêşa Tirk ya dagirker û 12 çeteyên wê hatin kuştin.**

FacebookTwitterWhatsAppTelegram




Hêzên Rizgariya Efrînê (HRE) çalakiyên xwe yên li dijî dewleta tirk ya dagirker û çeteyên wê roj bi roj zêde dike. HRE'yê bi daxuyaniyêkê ragehand ku di ancama çalakiyên bersivdayînê de, herî kêm 16 dagirker hatin kuştin.

HRE'yê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku li hember êrişen dagirkeriya tirk û çeteyên wê, di çarçoveya parastina rewa de, hêzên wan derbeyên giran li dagirkeran dan. HRE'yê da zanîn ku di roja 23'yê Tebaxê de, li gundê Meryemînê ya navçeya Şera, li hember baregeha artêşa Tirk a dagirker çalakiyek taybet hat lidar xistin û di encamê de 2 leşkerên dagirker hatin kuştin, 1 leşker jî birîndar bû. Herwiha diyar kir ku di roja 4' ê Îlonê de, li gundê Kil Cibrîn ya navçeya Ezazê, li dijî baregehek artêşa Tirk a dagirker çalakiyek hat lidar xistin û di encamê de leşkerek hat kuştin, 2 leşker jî birîndar bûn.

HRE'yê da xuyakirin ku di 7'ê Îlonê de, li eniya Hirbilê ya girêdayî herêma Şehba, di çalakiyek de 4 çete hatin kuştin, 1 çete jî birîndar bû û erebeyek çeteyan jî hat rûxandin. Herwiha da zanîn ku di roja 8'ê Îlonê de, nêzî gundê Şêx Îsa ya girêdayî bajaroka Til Rifatê di encama çalakiyekê de leşkerek dagirker hat kuştin.

HRE'yê diyar kir ku di 9'ê Îlonê de, li Cerablûs û li bejahiya herêma Efrînê du çalakiyên bibandor hatin li dar xistin û di encamê de 2 çete hatin kuştin. Herwiha anî ziman ku di çalakiya din de jî depoyek cebilxaneyê ya çeteyên dagirker hat hedef girtin. Di encamê de 6 çete hatin kuştin, depoya cebilxane bi temamî hat ruxandin.

Di encama van çalakiyên me anîn ziman bi giştî 4 leşker û 12 çete hatin kuştin, 3 leşker û çeteyek jî birîndar bûn.

# Hakan Fîdan li Bexdayê bi Alîyên Sîyasî re hevdîtin Kir

**Navenda Nuçeyan**

**Serokê Hevpeymaniya Serweriya Sunnî Xemîs Xencer li gel Serokê Îstîxbarata MÎT'a Tirk Hakan Fîdan li Bexdayê civiya.**

Êrişên dewleta Tirk a dagirker yên li ser Başûrê Kurdistanê bê navber didomin. Dewleta Tirk a dagirker bi balefiran bi çekên kîmyayî sivîlan



qetil dike û xwezayê tarumar dike. Serokê Hevpeymaniya Serweriya Sunnî Xamis Xencer li Bexdayê li gel Serokê Îstîxbarata MÎT'ê ya dewleta Tirk a dagirker Hakan Fîdan re civiya.

**Di vê pêvajoyêde hevdîtin balkêşe**

Hevdîtina ku hatî kirin di demek wisa de ye ku dewleta Tirk li herêmên Zap, Metîna û Avaşînê windahiyên mezin dide, pêkhatiye. Hêjayî gotinê ye Serokê Hevpeymaniya Serweriya Sunnî Xamis Xencer ji beriya êrişên dewleta Tirk yên di meha Nîsanê de dayî destpêkirin, di 26'ê Sibata sala 2022'an de li gel Serokkomarê dewleta Tirk Erdogan re civiyabû.

**Tirk Dixwazin Ji Tevlîheviya Hûndirîn Ya Iraqê Sûdê Wer bigrin**

Di êrişên herî dawî yên dewleta Tirk a dagirker yên li ser Başûrê Kurdistanê de gelek sivîl hatin qetilkirin. Di komkujiya ser gundê Perex a girêdayî Zaxoyê de 9 kes jiyana xwe ji dest dabûn û 33 kes jî birîndar bibûn. Herwiha herî dawî balafira bê mirov ya dewlet a Tirk a dagirker malek penaberên wargeha Şehîd Rûstem Cûdî mexmûrê kiribû hedef, di encama êrişa hovane de welatiyê bavê 6 zarokan ê bi navê Ebûzêd Dêrhînî jiyana xwe ji dest da bû.

Li gel ku bang û daxwazên li hemberî êrişên dewleta Tirk a dagirker her ku diçe zêdetir dibe, dewleta Tirk bi destê PDK'ê li Iraqê di navenda siyasetê de krîzan li dardixe ku nerazîbûnên li hemberî berfirehkirina êriş û dagirkeriya xwe lewaz bike.

# ’Bi pêngava Mirovî û Ewlehiyê planên çeteyên DAIŞ’ê û dagirkeriya tirkî têk çûn’

## Siyamend Elî diyar kir ku pêngava Mirovî û Ewlehiyê gelek planên çeteyên DAIŞ’ê Têk birin û got, heta çareseriyeke bingehîn ji pirsgirêka çeteyên DAIŞ’ê û malbatên wan re neyê dîtin, wê xwetera wan dewam bike

Ji ber zêdebûna kiryarên şaneyên çeteyên DAIŞ`ê û tinebûna Ewlehî û aramiyê li kampa Holê, Hêzên Ewlekariya Hundirîn bi piştgiriya QSD, YPG/YPJ`ê 25`ê Tebaxê dest bi Qonaxa duyemîn ya Pêngava ‘Mirovî û Ewlehiyê` li Kampa Holê kir. Heta niha jî pêngav didome. Herwiha di dema paqijkirin û lêgerîn de gelek çek, cebilxane, tûnel , cihên perwerdeya DAIŞ’ê û cihên dadgehkirinê û işkencekirinê hatin bêbandor kirin, herwiha bi dehan endamên çeteyên DAIŞ’ê hatin girtin.



Derbarê pêngava mirovî û Ewlehiyê de, berpirsê Ragehandina Yekîneyên Parastina Gel ( YPG) Siyamend Elî ji me re axivî. Siyamend Elî diyar kir ku bi zêdebûna êrişên dewleta tirkî ya dagirker yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê , kiryarên şaniyên çeteyên DAIŞ’ê yên veşartî yên di nava Kampa Holê de jî zêdebûn e û wiha domand: “Kampa Holê zêdeyî 56 hezar ji malbatên çeteyên DAIŞ’ê ’ê dihewîne, kamp di sala 2018’an de hat avakirin û piştî têkçûna DAIŞ’ê li ser destên QSD’ê, hejmareke mezin ji malbatên çeteyên DAIŞ’ê li kampê hatin bicihkirin. Piştî zêdebûna gef û êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, liv û tevgera şaneyên çeteyên DAIŞ’ê di nava kampê de zêde bûn û gelek kesên li kampê li ser destê endamên şaneyên DAIŞ’ê hatin kuştin.”

### ’Armanca çeteyan piştî girtîgeha Xiwêran, Kampa Holê bû’

Siyamend Elî bal kişand ser êrişa şaneyên çeteyên DAIŞ’ê ya li ser girtîgeha Xuwêran ya Hesekê ku 5 hezar çeteyên DAIŞ têde tên girtin û wiha got: “Li gorî mikurhatina çeteyên ku niha hatine girtin, istixbarata Tirkiyê roleke mezin di destekdayîna çeteyên ku êrişî girtîgehê kiribûn, kiriye. Çeteyan plan kiribûn ku destpêkê ew ê êrişî girtîgeha Xiwêran bikin û çeteyan ji girtîgehê derxin, pişt re êrişî Kampa Holê bikin û xwe bighînin herêmên dagirkirî. Lê ji ber lehengiya QSD’ê, YPJ’ê , YPG’ê, Hêzên Ewlekariya Hundirîn



û gelên herêmê, planên DAIŞ’ê û dagîrkeriya tirkî têk çûn”

### ’Pêngava Mirovî û Ewlehiyê di demeke guncaw de dest pê kir’

Siyamend Elî da zanîn ku ji bo pêşîgirtina li ber kiriyarên çeteyên DAIŞ’ê û têkbirana çavkaniyên wan, Hezên Ewlekariya Hundirîn û bi alîkariya QSD’ê , YPJ û YPG’ê qonaxa didiwan ji pêngava Mirovî û Ewlehiyê dan destpêkirin û wiha got: “Di salekê de bûyerên kuştina nişteciyên kampê gihişte 44 bûyeran û di encamê de 45 kes li ser destê çeteyan hatin kuştin û gelek jî birîndar bûn. Ji ber zêdebûna kiriyarên şaneyên DAIŞ’ê,, pêngava Mirovî û Ewlehiyê di 25’ê Tebaxê de hat destpêkirin. Hêzên ewlekariyê di dema lêgerînê de gelek çek, cebilxane, madeyên teqemeniyê, Amûrên pêwendiyan, Tûnel, cihê perwerdekirinê, cihê dadgekirin û işkencekirinê, dîtin û bê bandor kirin. Ev tekez dike ku eger hêzên ewlekariyê di vê demê de pêngav pêkneanîban ye, wê rewşa kampê ji bin kontrolê derketiba.”

### ’Serçeteyên Artêşa Niştîmanî çeteyên DAIŞ’ê birêve dibin’

Siyamend Elî da xuyakirin ku armanca wan ya sereke ji pêngavê girtina berpirsên şaniyên DAIŞ’ê yên di nava kampê û yên derveyê kampê ne û wiha axaftina xwe dewam kir: “Hêzên ewlekariyê bi dehan ji endam, serçete û şaneyên ku pere ji çeteyan re peyda dikin girtin. Van çeteyan bi awayekî rêxistinkirî, xwe di nava kampê û derveyî kampê birêvedibirin û kiryarên terorê pêk dianîn. Li gorî mikurhatina çeteyên hatine girtin, çete fermanên xwe ji berpirsên çeteyên bi navê Artêşa Niştimanî



ku girêdayî deweleta tirkî ne, digrin. Herwiha eşkere bû ku gelek serçeteyên DAIŞ’ê li herêmên dagîrkirî dimînin.”

### ’Divê hêzên navnetewyî bi erkê xwe yê exlaqî rabin’

berpirsê Ragehandina Yekîneyên Parastina Gel ( YPG) Siyamend Elî bang kir ku hêzên navnetewî bi erkê xwe yê exlaqî rabin û çareseriyek ji çeteyên DAIŞ’ ê re bibînin û axaftina xwe wiha qedand: “Pêngava mirovî û Ewlehiyê xetera çeteyên DAIŞ’ê heta astekê kêm kir, lê heta çareserî ji girtî û malbatê çetyeyên DAIŞ’ê re neyê dîtin, wê xetera wan dewam bike. divê tevayiya hêzên cîhanê bi erka xwe ya exlaqî rabin û çareseriyêkê bingehîn ji pirsgirêka çeteyên DAIŞ’ê û malbatên wan re bibînin. Herwiha divê êrişên dewleta tirk ya dagirker yên ser herêmê, bên sekinandin. Ji ber ev êriş ji bo çeteyên DAIŞ’ê piştgiriye. Pêngava Mirovî û Ewlehiyê gelek planên çeteyên DAIŞ’ê û dewleta tirkî ya dagirker têk birin, heta astekê aramî di kampê de çêkir û wê dewam bike, heta bighêjie armanca xwe.”



### PDK Stuna mayîna Tirkiyê ya di Başûr de ye

**DILYAR CIZÎRÎ**

Ev demeke dewleta Tirk li Zap, Metîna û Avaşîn derbeyên giran ji gêrîlayên azadiyê dixwe, vir de û wir de diçe da li ser binkeftinên xwe bigire. Serdana Berpirsê istixbarata Tirkiyê Hakan Fîdan a ji Baxdayê re jî, di vê çarçoveyê de pêk hatiye. Serdana Hakan Fîdan di demekê de welê pêk hatiye, aloziya Iraqê ya siyasî kûr bûye û ber bi xetimandinê ve çûye. Di heman demê de hevgirtina di navbera Barzanî, Sedir û Helbûsî de bê bandor bûye.

Îcar dewleta Tirk di vê serdanê de dixwaze projeya xwe ya dagirkirina xaka Başûrê Kurdistanê rewa bike û piştgiriya aliyên siyasî yên Iraqê jî bi dest bixe. Herwiha hevdîtina Serokê PDK’ê Mesûd Barzanî ya li Hewlêrê bi Xemîs Xencer û Helbûsî re di berdewama heman plane de pêk hatiye. Ew jî bi serkêşî û Fermana Hakan Fîdan hatiye pêşxistin. Dewleta Tirk bi vê projeyê dixwaze cebeheya Barzanî bi siniyên Iraqê re di xizmeta xwe de pêş bixe.

Di ser wan re jî xewna xwe ya Mîsaqa Milî pêk bîne û Kerkûk, Mûsil û beşek mezin ji xaka Iraq û Başûrê Kurdistanê dagir bike û bi ser xaka xwe ve berde. Di heman demê de sûdeke wan ya din jî ewe ku eniya li dijî Tevgera Azadiyê di herêmên parastina Medya de jî fireh bike. Di şer de hîn zêdetir alîgirên xwe zêde bike û zextê li raya giştî bike.

Me beriya niha jî behsa wê kiriye, dewleta Tirk ji bo projeya xwe ya dagirkeriyê her tiştên derqanûnî rewa nîşan dide. Her çendî dirêj bike jî êdî wê dewleta Tirk nikaribe vê projeya xwe ser bixe. Sedema yekem projeya dewleta Tirk li ser erdê nema dikare bibe anternatîfa projeyên aliyên heyî. Ya din jî hêza Iranê ya di xaka Iraqê de ye. Projeya Iran jî li kêlek ya Tirkiyê dimeşe.

Îcar dewleta Tirk piştî êrişa li Zaxo ya qetilkirina turizmên Iraqê ya li Xazoya Başûrê Kurdistanê êdî hebûna wê ya li ser xaka Iraqê di nava civaka Iraqê de nem qebûl dibe . Lê pirştgiriya wan a ji PDK’ê girtine temen û hebûna wan dirêj dike. Yenî heger ne hevkariya PDK’ê ya bi dewleta Tirk re ba, wê serdana Hakan Fîdan û pêşwazîkirina wî ya li Bexdayê jî ne wiha hêsan ba ye. Yenî mayîna dagirkirina Tirkiyê ji xaka Başûrê Kurdistanê di serî de bi destê PDK’ê ye.

Bi riya PDK’ê jî projeyên xwe yên li Sûriyê pêk tîne û xalên serke dirêsîne. Ji ber wê jî ji gelê Kurd, aliyên siyasî û heta hevkar û alîgirên PDK’ê yên dilê wan bi ser berjewendiya Kurdistanê ve ne, tê xwestin li dijî siyasetên PDK’ê û hevkariya wan a bi dewleta Tirk re jî bisekene. Ji ber PDK’ê û siyaseta wê ya di xizmeta dewleta Tirk de, bûye stûnê bingehîn ê siyaseta wan. Serdana Hakan Fîdan a Bexda û Hewlêrê jî di heman çarçoveyê de pêk hatiye.

Lê tişta li ber çavan diyar dibe, dewleta Tirk û hikûmeta AKP/MHP’ê gelek zehmetiyan jiyan dikin. Riya xelasa wan jî niha bûye PDK’ê ya di rêza yekem de dijberiya berjewendiyên gelê Kurd dike.



# `Bi rihê şoreşgerên di 12`ê Îlonê de li ber xwe dane, emê dagîrkeriyê têk bibin`

## Rûken Ehmed diyar kir ku, ji bo gelê şoregerî bi ser nekeve, dewleta tirk derbeyê 12’ê Îlonê wek çareseriyê dît û got, eger em bi rihê şoreşgerên ku li hember 12’ê Îlonê li berxwe dayîn tekoşîn bikin, emê bi ser bikevin.

**Bêrîtan Çiya-Qamişlo**

12`ê Îlona 1980’yê de artêşa dewleta tirk bi Serokatîya Kenan Evren, artêşa Tirkîyê darbeyeke leşkerî ya faşîst li dar xist. Bi darbe ya 12’yê Îlona 1980’yê, bi sedhezaran kes li Bakurê Kurdistanê û li Tirkîyê desteser kirin, girtin û îşkence kirin. Wê demê ji ber kiryar û zilma artîşa dewleta tirk, bi deh hezaran neçar man ku mal û milkên xwe bihêlin û ji welatê xwe koç bibin. Herwiha bi sedan kes hatin kuştin, hatin îdam kirin û hatin revandin.

Tevayîya partîyên sîyasî, kesên serbixwe, dezgehên sivîl , hemû dezgehên çapemenîyê bi destê darbekaran hatin qedexe kirin û girtin. Darçûna 12`ê Îlona 1980’yê zerareke mezin gîhand tevgera azadiyê ya Bakurê Kurdistanê û tevgerên demokrat, azadîxwaz yên li Tirkiyê.

Li ser mijarê hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk ya TEV-DEM’ê Rûken Ehmed, ji me re axivî. Rûken diyar kir ku berxwedana zindana, armanca 12`ê Îlonê têk bir.

Rûken Ehmed, axaftina xwe wiha domand: “Ji bo dewleta tirk siyaseta xwe ya desthiladariyê bide meşandin û rê li ber gelê şoreşger bigire, pêwîstî bi derbeya 12’ê Îlonê dît. Dewleta tirk xwest bi vî rêbazê, tekoşina azadiya gel bi paş de bide avêtin. Mirov dikare bêje bi vê armancê Artêşa Tirk 12`ê Îlonê darbe pêk anî, lê berxwedana şoreşgerên li zîndana Amedê ev



armanca wan têk bir û tekoşina azadiyê roj bi roj xurtir bû.

### `Armanc şkandina vîna gel bû`

Rûken Ehmed destnîşan kir ku, ne ji berxwedana zindana ba ye, wê zihniyeta desthiladar ya 12`ê Îlonê, bi ser ketiba û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Di encama derbeya 12`ê Îlonê de, bi 10 hezaran mirov koçber bûn. Herwiha bi 100 hezaran mirov hatin girtin. Lê tevî zilm û zora li zindana, ti kesî serê xwe li hember dijmin netwand. Hevalên di zindanan de, bi berxwedana xwe careke din bi rihê azadiyê, moralê gelê şoreşger bilind kir û armanca dewleta tirk ya qirkirina tevgerê, têk birin. Mirov dikare bêje, şoreşgerên di zindanan de bi têkoşîna xwe ji dewletê re diyar kir ku, wê teslîmbûyînê ti caran qebûl nekin û wê serkeftin ya wan be.

### `Ti ferqa hişmendiya tirkî ya niha û ya 12’ê Îlona 1980’yê nîne`

Hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk ya TEV-DEM Rûken Ehmed li ser mijara 12’ê Îlonê axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Di wê demê de jî berjewendiyên dewletên navneteweyî wek niha hebû. Zihniyeta feşîzima 12`ê Îlonê û hê jî



mestir heta niha berdewan me. Di wê demê de dewletan li dijî dewelta tirk helwesta xwe diyar kirin, lê niha çima bêdengin? Ji ber ku berjewendiyên wan pir di vê rewşê de hene. Li dijî bêdengiya dewletên hegemon, gelê Kurd, yê azadîxwaz, herwiha hevalên di zindana de li ber xwe didin û çalakiyên cuda li dar dixin. Lewra yê ku wê faşîzmê têk bibe, rabûna gelan e. Çawa berxwedana li hember 12`ê Îlonê bi ser neket, divê bi wî rihî em jî tev bigerin û dagîrkeran têk bibin. Herî dawî ez banga li civaka nevnetewî dikim ku li hember siyseta dewelta tirk ya qirkirina gelê Kurd, helwesta xwe diyar bikin û erkê xwe yê mirovî pêk bînin.

# `Azadiya Rêber APO azadiya civak û jinê ye`

**Navenda Nûçeyan / Qamişlo**


**Endama saziya Malbatê Şehîdan Rojda Ehmed diyar kir ku wateya rast ya jiyana azad di kesayeta Rêber Apo de tê dîtin û got, Rêber Apo bi fikr û felsefeya xwe azadiya rast pêşkêşî jinan kir û deriyê jiyanê ji wan re vekir**

Ev 23 sal in tecrîda giran li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tê meşandin. Ev tecrîd ji hêla dewletên faşîst ve tê kirin, bi armanca şikandina îradeya civakê û kûrkirina aloziya ku niha li cîhanê tê jiyan kirin. Ji ber ku ew dewlet baş dizanin, fikir û ramanên Rêber Apo riya çareseriya aloziyê ye. Ev jî li dijî berjewendiyên wan yên dagîrkeriyê ye.

Derbarê tecrîda ser Rêber Apo û armanca wê, endama Saziya Malbatên Şehîdan Rojda Ehmed ji me re axivî.

### ’Rêber Apo mînaka jiyana azad e’

Rojda Ehmed diyar kir ku armanca tecrîdê qutkirina civakê ji fikrê Rêber Apo ye û wiha got: “Wateya rast ya jiyana azad, di kesayeta Rêber Apo de tê dîtin, bi riya fikir û felsefeya xwe azadiya rast pêşkêşî jinan û gelên bindest kir. Jin jî azadiya xwe di azadiya Rêber Apo de dibînin, ji ber ku deriyê jiyanê ji wan re vekir û jin di nava 4 duwaran de derxist. Bi naskirina kesayeta Rêber Apo azadî bi rengek cuda



hat jiyan kirin. Girankirina tecrîdê li ser Rêber Apo, bandorê li ser azadî û kesayeta jinan jî dike. Ev tecrîd ji hêla dewletên faşîst ên ku li ser navê demokrasiyê bang dikin ve hat ferzkirin. Bi saya ramanên Rêber Apo jin û civak karîn rastiya xwe nas bikin û bijîn, ji ber vê yekê xwestin tecrîda girankirî li ser Rêber Apo bidin meşandin û fikrên wî ji civakê bidin qutkirin, da ku li gorî xwe civakê û bi taybetî jinan bi kar bînin.”

### ‘Azadiya Rêber Apo Çareseriya şer û aloziyan e’

Rojda Ehmed da zanîn ku jinan bi riya fikrên Rêber Apo çareseriyê ji pirsgirêkan re dibînin û wiha got: “Jin bi riya xwendina fikir û felsefeya Rêber Apo, dikaribûn çareseriyê ji pirsgirêkan re bibînin. Ji bo ku em tecrîda li ser Rêber Apo bidin şikandin, dive em têkoşînek xurt bimeşînin. Çalakî û berxwedana ku li zindana Îmraliyê û derveyî zindanê tê kirin, bû bersiv ji ferzkirina tecrîdê re. Wê jin bi îradeya xwe, civakê ji qirkirinê rizgar bikin, ji ber ku felsefeya azadiyê nas kirin e. Azadiya Rêber Apo çareseriyek ji şer û aloziya ku niha tê jiyîn re ye. Dewleta tirk jî daxwaz kir ku bi meşandina tecrîdê temenê aloziya li Rojhilata Navîn rû daye dirêj û kûr bike, heta ku berjewendiyên xwe pêk bîne.”



### ’Azadkirina Rêber Apo erka tevayiya jinan e’

Endama Saziya Malbatên Şehîda Rojda Ehmed diyar kir ku rakirina tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, erkeke dikeve ser milê tevayiya jinên azadîxwaz û axaftina xwe wiha qedand: “Azadiya Rêber Apo û şikandina tecrîdê erka sereke ya li ser milê gelên azadîxwaz giş e, bi taybetî jî erkê jinan e. Ji bo azadiya Rêber Apo em ê asta xebatên xwe bilindtir bikin. Rêbertî di aliyê fikrî de, di zindana Îmraliyê de azad dijî, em êjî ji aliyê fizîkî ve wî azad bikin, da ku li ser axa Kurdistanê em bi hev re bijîn.”

### Dewleta Tirk, Faşîzm Jî Xerab Kiri ye

**Memed Serdar**

Dewleta Tirk ya dagirker li ser esasê qirkirina gelan bi taybetî jî gelê Kurd, hatiye avakirin. Di ferhengê wan de biratî, hevaltî, cîrantî û nirxên mirovayî nîne û tiştên wiha nas nakin. Paşverûtiya tirkan gihîştiye astekî ku heta faşîzm jî, li gor xwe şîrove kirine. Li gor nerînên beşek ji sîyasetmedaran, faşîzm jî xerab kirine. Ji ber ku dewletên fikrê faşîzm ji xwe re esas digrin, gelê xwe di ser hemû gelan re dibînin û li gor firkrê wan, hemû gelên din divê xizmetê wan bikin. Di dîrokê de yê îdeolojî ya faşîzmê avakirî jî, gelên din biçûk dîtine, tûne hesibandine. Lê ti dewletan zext li kesan nekirine ji bo ku netewa xwe bigûhere. Li gor taybetmendiyên îdeolojiya faşîzmê, kesekî ne ji gelê wan be, xwe bike ji gelê wan, ew qebûl nakin. Dibêjin em gelek pîrozin, hûn gerek xizmeta gelê me bikin. Lê faşîst ê herî xerab dewleta Tirkî ye, ev sed salin bi darê zorê ji Kurdan re dibêje ``Hûnê bêjin em Tirk in``.

Weke gel bê şansiya me ya mezin ewe ku, em bi Tirkan re bûn cîran û piştre jî ew bûn dijminên me. Di cîhanê de kîjan dewlet dijminê me bûya, niha me deh caran pirsgirêkên xwe çareser kiribûn. Lê dewleta tirk, ji ber weke destpêkê me got, nirxên mirovayî li cem wê nîne yan jî pir lawaz e. Îlmî nafikirin û nîqaşan encam nagirin. Hemû hêzên cîhanê niha hewl didin ku pirsgirêkên xwe bi diyalog, dîplomasî û nîqaş çareser bikin. Hemû hewl didin şer kêm bibe, aşîtî û mirovayî pêş bikeve. Di cîhanê de tenê dewleta tirka ya dagirker xwe ji bo şer amade dike û hemû pirsgirêkên xwe bi şer dixwaze çareser bike. Ji ber ku, rê û rêbazeke din heta niha nizanin. Berîya hezar sala çawa ji Asya Navîn ji bo hatine gîhîştine Anadolê û bakûrê Kurdîstanê, niha jî bi heman zihniyet û bi heman tarzê jiyanê dixwazin deshilata xwe berdewam bikin.

Hem ji ber çanda dîrokî, hem jî di serdema nû de, ji xwe re fikreke ku faşîzmê xirabtir, esas girtiye. Mafê xwe dibîne ku destdirêjiya jiyan û hebûna hemû gelan bike; Çand û zimanê gelan qedexe bike, gûhartina demografî bike û li gor berjewendiyên xwe ji nû ve teşe bide gelan.

Di dîroka dewleta tirkan ya dagîrkerde bi dehan gel hatine helandin û tinekirin. Weke nûmûne Laz, Çerkez, Rum; Ermen, Asur, Siryan, Kildan hwd. hebûna van gelan li Tirkiyê weke nav tinê maye. Helîyane û hatine tinekirin. Bi pêşengiya partiya azadiya netewa Kurdîstanî (PKK’ê) gelê Kurd tenê kariye li berxwe bide û xwe ji helandinê û tinebûnê rizgar bike. Ji bo hebûna gelê Kurd biparêze ev 50 salin tekoşînê dike.

Ne pêşketina teknîk-teknolojî û medeniyet, ne jî dersên dîrokî, di fikir û siyaseta dewleta dagirker ya tirkan de, gûhertinek biçûk jî çênekiriye. Ev siyaseta înkar û îmhayê, heta roja îro didome. Mînakê herî nêzîk beriya çend rojan, şefê faşîstê xerabe Erdogan derket ser televîzyonê û li ber çavê hemû cîhanê got: ``Herêma bakûrê Sûrî ji bo çand û jîyana Kurdan ne gûncave, li wan herêman emê ereban bicîh bikin. Ew herêm ji bo çand û jîyana ereban gûncavtire``. Bi vê gotinê hemû cîhan baştir fêmkir ku ew hicetên ``êrîş li ser me hene``, `` fikarên me yê ewlekarî hene`` hemû derewin. Hedefa wan ya rastî, şefê wan ê faşîst bi xwe, ber çavê hemû cîhanê li xwe mûkûr hat û pîlanê xwe eşkere kirin.

Piştî van gotinan yê dixwazin derewan gûhdar bikin, cardin jî dikarin Erdogan û hevkarên wî gûhdar bikin. Lê ji vir waha, kes nikare bi van derewan gelê herêmê bixapîne. Herwiha hember van rastiyan kî van derewan gûhdar bike û jê bawer bike, şirîkê faşîzmê ye. Divê ev jî waha bê zanîn.